

**DOSYA:**

EDEBÎYATA SORANÎ DI SEDSALA XXEM DA

Edîtor:

**Doç. Dr. Hemin Omar Ahmad**



## PÊŞEKÎ

Kovara Nûbihar Akademîyê gihîşt hejmarê xwe ya 21ê. Wek çend hejmarên berê, em di vê hejmarê da jî li ser bernameya xwe ya taybetkirina dosyayekê bo mijareka taybetî dewam dikin û ji bo wê çendê jî ev hejmar wek ku me berê ragihandibû, bo edebiyata Soranî ya sedsala bîstan hat terxankirin. Bi sedem ku Nûbihar Akademîyê berî niha li ser babetên wek Yarsan û Zaza dosyayên taybetî amade kiribûn, vê carê wek pêwîstîyekê dît ku li ser Soranî jî dosyayekê taybetî amade bike. Edebiyata Soranî di sedsala bîstan da di nav hemî diyalêktên Kurdî de cihekî gring digire û ji xencî şîrê wek cureyê edebiyatê, di cureyên din da jî bi pirberhemî û dewlemendî tê hejmartin. Lewma eger sedsala nozdan sedsala jidaykbûn û linggirtina helbesta Kurdîya Soranî be, Sedsala bîstan jî sedsala xortîni û kamilbûnê ye û hejmareke zêde helbestvanên klasîk û klasîka nû dikevin nav vê sedsalê.

Egerçî ji bo dosyaya me tenê du gotar amade bûn û ji layê hekeman ve hatin peji-randin, lê ew du gotar jî ji bo kovara me gring bûn. Ji wan gotaran yek bi zimanê Farsî ye, ku bi nêrîna me gringîya xwe heye, lewma lêkolîn bi zimanên din derheqê edebiyata me da pêngaveke girîng e, bo zêdetir nasandina edebiyata kurdî di nav xûnerên zimanên cuda da. Cihad Shukrî Rasheed, di gotara xwe ya bi zimanê Farsî da qala şa'îrê bi navûdeng Safî Hîranî (1873-1942) kirîye, bi taybetî jî rengvedana qelenderîtiyê di helbestên Kurdî û Farsî yên şa'îrî da û sîmayên rêbaza qelenderîtiyê di nav helbestên wî da. Safî yek ji rêberên terîqeta Qadîrî bûye li navçeya Xoşnawetî li Hewlêrê û wî ji gelek şa'îrên Fars bandor girtîye û tesîr li gelek şa'îrên serdema xwe jî kirîye.

Pakhshan Sabir Hamad jî di gotara xwe da behsa ziman û ezmûna Muftî Pêncwênî (1881-1952) kirîye, ku Muftî helbestvanekî bi şêwe klasîk, lê bi naverok realîst e. Nivîskarê di gotara xwe da qala poetîkaya zimanê helbestvanî kirîye û fer-henga helbestên wî ya ku dirûv daye hişmendîya wî bi hurgulî destnîşan kirîye. Muftî Pêncwênî wek kesatîyekî hişyar di nav civakê de, xwestîye peyama xwe bo civaka kurdî aşkera bike û wek muslîheki civakî hizrên xwe bîne ziman û hawara xwe bo gelê xwe ji hemî alîyan ve bi zimanê şîrê nîşan bide.

Wek xala dawî, eger em bûbin egera nasîna du nûnerên edebiyata soranî yên sedsala XXem li Bakur, ev yek bo me cihê kêfxweşîyê mezin e.

**Doç. Dr. Hemin Omar Ahmad**

Edîtorê Dosyayê

